

## Çareserkirina Pirsgirêka Alfabeya Latînî ji bo Kurdî<sup>1</sup>

Avdo Karataş<sup>2</sup>

### Destpêk

Alfabe û zimanê kurdî mijarekê gelek girîng û ew kasî jî girîft e. Ango zimanê kurdî bixwe, ji bo sedemên aşîkar, nê zimanêkî standard e (Strohmeier; Yalcin Heckmann, 2003: 31). Sinorê di nava zimanê kurdî de hem horîzontal hem jî diyagonal kûr û berfireh in. Lê belê ev naye we wate ku zimanê kurdî ji zimanê dî ye cîhanê kemtir an jî bêqîmettir e. Wekî em kurdî bidin ber zimanê dewletê neteweyên (*Nationalstaat*) yekemînê cîhane wek fransî û îtalî û almanî, li dema ku ev dewlet hatine saz kirin, em ê bibînin ku kurdî di rewşeke baş de ye. Hinga di sala 1789'an de Fransa hatî saz kirin, tene nîve fransîya dikaribû fransî b'axivin<sup>3</sup> û ji va kesan jî tene ji % 12-13'a dikaribûn bi rastî bipeyvin. Mîrovê din bi devokên (*patois*) cur bi cur d'axivîn. Hinga Îtaliya yekîtiya xwe di sala 1860'an de saz kirî, tene ji % 2,5 di nava gêle îtaliyan da îtaliyanî bi kar tanin.<sup>4</sup> Di nav mijara *netew-bûn* de mînakên wisa pir in. Lê îro ji % 60'i behtir kurd bi zaravakê d'axivîn. Hêjayî gotinê ye ku: *zimanê standard nîne, ziman tê standardkirin*. Ji bo vê standardkirinê jî pedivî bi sazîyên mazin wek "Sazîyên Dewletê" heye. Krîzen îro, yên zimanê kurdî, ne pirsgirêkên pir-zaravî an jî pir-devokî ne, krîza zimanê kurdî, krîza nebûna dewleta kurd a bi serxwe ye.

Gelek mirovê zanyar û siyasetmedar hene ku dibejin "zimanekî kurda ye standard nîne, ji bo vê nikarin bibin netew". Ev çewt e û ne rast e. Ya rastî, wek mînakên Hobsbawn yê ku li jor hatine danin, bi me didin xwiya kirin, ev e: Zimanê kurdî ne standard e<sup>5</sup> ji ber ku dewleta kurda nîne. Ango mijar li wê derê ne mijara

1- Ew nivîs di sala 2010 an de ji bo Semînera Mamostetiya Kurdi ji bo Zanîngeha Bonn, Institut für Orient- und Asienwissenschaften. Abteilung Islamwissenschaften re hatibû amadekirin.

2- Xwendevanê Doktora di bêja etnolojiya Ewropa di Zanîngeha Freiburg, Almanyayê.

3- Di rezika Rêzimana Kurdî de du dengdêr nayan cem hev. Lê belê gelek lêker hene ku bi tîpekê rengdêr dest pê dikin û pêspirtîkekê (prefix) bi tîpekê dengdêr dawî dibin. Di vê rewşê de pêspirtîktîpa xwe ya dawî ya dengdêr daveje. Mînak ; (bi)axive dibe baxive. `î` dikeve. Mîrhov kare di vir de pêşniyaz bike ku ketina tîpê bi alîkariya kirtêne (apostrof) bide xwiya kirin. Ew rewş di fransî de heye, wek l'écôle.

4- Van Bruinessen 1997: 190. Bruinessen ev mînak ji Hobsbawn 1990:60-61 girtine.

5- Ev ghotar naye we wate ku Kurdî qet nehatiye standart kirin. Ew gotar di wateya zimanêkî standart ku gel tev be bi axive û binivîse de hatiye gotin.

“Ziman û Netew” e û alfabe ya latîni-kirine ye, dive nerîn werê ser mijara alfabê.

Mijara alfabe yê ji beşek mijara zimên e. Alfabe, bingeha “*zimanê nivîsî*”<sup>6</sup> ye. Bi rastî kurdî, wekî em kurdî û rusî an almanî an jî çînî bidin ber hev, nê zimanekî wek wa yê nivîsî ye. Çandeyk e nivîsî ya mezin di dîrokê de çenêbû ye. Alfabe ye kurdî ye taybetî hene, belê li nav gel de belav nebûne.<sup>7</sup> Kurda di heman demê de gelek alfabeyê bi kar anîne. Ango kurd ew bi salana di bin sistem û dewletê cur bi cur de dijin, terciha wa ne terciheke azad e, mecburî mane, wa alfabe yê cur bi cur bi kar bînin.

Lê belê îro rewş hatiye guherandin. Li Kurdistanê Başûr kurd heta radeyekî bi ser xwe ne. Ango heta radeyekî vîna (îrade) wa ketiye deste wa û mecbur in pergalekî (sistem) ava bikin, kurdê Başûr bi rastî “*pirsgirêkê sistem-kirine*” hatine. Ji ber ku du zaravayê mezin û çendekî biçuk di vê herêmê de têne axiftin, girîftika pirsgirêkan jî mezintir dibe. Yek ji va pirsgirêka jî standardkirina zimên û pirsgirêka ku bi vê ve girêdayî yanî pirsgirêka standardkirina an jî yek-kirina alfabe yê ye. Di jêr de we li ser vê arêşeya Kurdistanê Başûr guftûgo wêre kirin.

### Di Dîroka Herêma Kurdistanê Başûr De Ziman û Alfabe

Her çiqas bêrî *Şerê Cihanê yê Yekemîn* li herêmê di medresa de perwerdeyî hebû û gelek kesayetiyê mezin di beşên wêje, filosofi, dîrok û zanyarî derketibin jî, dibistana modern û bi zimanê kurdî bi *Şerê Cihanê yê Yekemîn*’ re dest pê kirine.

Piştî hewldanên Şex Mahmud Berzencî têk çûn û ji aliyê îngilîza ve hate binçavkirin, di sala 1920’an de Komîsêrê Hezê Dagiriyê îngilîzî yên li Îraqê, Soane, li Başûrê Kurdistanê sazîyên rêveberî ji bo Kurden Başûr danîn. Armanca Soane ev bû ku bi alîkarîya çapemeniya bi zimanê zikmakî serdesta îngilîziya bi kurdan bide pêjirandin (Behrendt, 1993: 350). Soane dest bi pêşkirina zimanê kurdî kir. Zaraveyê Soranî bû zimanê standard yê herêma *Kurdistanê Xweserî* (Strohmeier; Yalcin Heckmann 2003: 119). Soane alîkarî da ku kovara heftî bi nave Pêşkeftin derkeve. Ev Kovar heta bi 118 hijmara berdevam kir. Kurmanciya jêr (Soranî) di dibistana de hat danîn û zarokên kurd bi kurmanciya jêr hatin perverdekirin. Hetta Soane bi xwe pirtukêk ya *Rêzimana Kurdî* û yekê ji bo xwendinê ji bo despêka dibistanê amade kir. Gelek dem neçû va çalekiya berhemên xwe dan. Ne dereng, kurdekî bi navê Hacı Mustafa Paşa kovara xwe bi xwe bi nave Bang-i Kurdistan derxist (Behrendt, 1993: 350).

Ango Suleymanîye navenda Mîren Baban bû, bajartî di wî warî de peşketi bû. Di ser de çalakîyên Soane ye li Silemanî, Kurmanciya jêr behtir peşvexist. Di aliyê dî

6- Ev gotar bi wate ya Ong (1995) hati ye bi kar anîn.

7- Yek jê; Wisif Zozanî. Eski Kürt Alfabesi. <http://www.gazetekurd.net/index.php/kurt-alfabe>

de herêma Behdînan, ku Kurmancî tê axaftin (Kurmanciya jor), di aborî de paşve ma bû û ji dêla bajartî bi pîranî di bin hukmîya eşîreta de bû. Alîkariya ku Kurmanciya jêr distand Kurmanciya jor nedistand û di dibistanên li herêma Behdînan de ziman an bi Erebi bû an jî Soranî bû (Bruinessen, 1997: 205). Di gengeşeya zarava da, Kurdê ku Kurmanciya jêr diaxivin<sup>8</sup> hewl didin ku Kurmanciya jêr wek pêşketîtir bidin erêdanî. Argumentên ku Soranîaxêv her demî tînin zimên ku Kurmanciya jêr zaraveyekî pêşketî ye, ji vir tê. Lê belê li aliyê din, di revşa Kurmanciya jor de pêşketinê girîng kêtine hola dîrokê de. Wê li vir were iddia kirin ku Kurmanciya jor di rewşa pêşketinê de gihaye qada Kurmanciya jêr.

Li Kurdîstana Bakur (Tirkî) bi pîranî, Kurdîstana Rojava/Başûrê Biçûk (Suri) bi tamamî, Kurdîstana Başûr bi qêdere nivê gelê herêmê, Kurdîstana Rojava (Îran) kutleyek Kurmanciya jor bikar tînin û di ser de Kurdê li Lîbnanê, li Rusya, li Ermenistan, li Ezerbeycan, li Georgiya Kurmancîaxêv in. Çiqas ti hijmarê fermî nebin jî, mirhov kare bejê ku ji 18 milyona behtir Kurdê Kurmancîaxêv hene û hijmara Kurde Soranîaxêv kasî 7 milyona ye. Çika di nav Kurdê bi Kurmanciya jor de alfabetên cur bi cur hebin jî, ji 1920' a vê alfabetaya latînî rolekê mezin dilîze.<sup>9</sup> Xebate Mîr Celadet Bedirxan (1986) û kovara *Hawar* li Şamê di nava sala 1932 û 1945 bingihê ke bi hez danî (Strohmeier; Yalcin Heckmann, 2003: 35). Di bêşa jêr de we gengeşe li ser mijara zimên û alfabe di Herêma Kurdîstana Başûr de wêre kirin.

### Gengeşeyê Ser Zimên û Alfabayê Di Herêma Kurdîstana Başûr De

Di tev gengeşeyên derhêqa zimên, di Herêma Kurdîstana Başûr de, bi giranî bi gengeşeya alfabayê re jî heye. Hingî diçe, gengeşeyê ser zimanekî standard ji bo Herêma Kurdîstana Başûr jî xurttir dibe.

Ew pirs jî wek Hesepûr anî ziman halo ye: “Di zimanê kurdî yê pirlheçeyî de, ku sê adetên xwe yên edebî yên serekî (hewramî, kurmancî û soranî) û du lehceyên standard hene, divêt zimanê resmî yê “hikûmeta herêma Kurdistanê” bi kîj lehceyê be?” (Hesepûr, 2010). Yê ku Kurmanciya jêr didin pêş, bi pîranî alfabe ya Erebi pêre difikirin û yê Kurmanciya jor tînin zimên alfabe ya latînî jî pêre difikirin. Li gora ramana Hesepûr heta niha du bersiv ji pirsîyarê re hatine danîn û ew ev in: “1- Soranî lehceya bi tenê ya standard e û divêt bibe zimanê resmî, û 2- kurdî, wek zimanê norwîjî, du lehceyên xwe yên standard hene û divêt herdu lehceyên wî yên serekî bîn resmî kirin.” Tişta balkeş di nav va pirsîs da ewê, ku behdînanî ji bo zimanê standard nehatiye hole. Hesepûr dixwaze Soranîaxêva wek “şovenîzma soranî” bi nav bêne û dixwaze Soraniya yên ku dibêjin “bila tenê Soranî bibe zima-

8- Hesepûr ji war a dibeje “Soranîaxêv”.

9- Ji bo ve mijarê meyzêne: Burkay 1997: 199 û wêde. Strohmeier & Heckmann 2003: 35 û wêde. Franz 1986: 30 û wêde.

nê standard“ rexne dike û du zaravaya dide pêş, lê belê babeta alfabe nayîne zimên.

Wekî mirhov li gotin û nerînên Soranîaxêva dinêre, yên ku dixwazin ku Soranî bibe zimanê seranserî, mirhov kare peyt/tespît bike ku ev tenê ji bo Herêma Kurdistanê Îraqê diaxivin, wekî ku *Mehemedê Mela Kerîm* di nivîsa xwê de tîne zimên: “Di rewşa gelê kurd de [...] her diyalekta her deverêkê bibe zimanê karûbarên rûniştivanên wê deverê û ev dê astengên mezin û giran bixe di rêya pêkanîna zimanê seranserî yê gelê kurd li herêma Kurdistanê Îraqê de” (Kerîm, 2008).

Mela Kerîm di nivîsa xwe de tîne zimên ku du diyalekt ji bo perwerdeya zarokên ku li wê deverê pê diaxivin, nabe werê dariştin: “ev tê wateya ku em berê binyatê duziman-kirina kurdiyê dadinin û em gelê kurd dikin bi du gelên weha ku her yekî ji wan zimanekê cida ji yên din hebe û nabe jî em bi karekê weha qayîl bibin.” Di wir de xwiya dibe ku armanca Soranan ne ji bo standardkirina zimanekî ji bo gelê Kurd e. Wekê li jor hate zimên, ji nîwî behtir Kurd bi Kurmanciya jor diaxivin lê belê ev rastî ji Sorana re ne girîng e. Soran wekî li ser mijara alfabeyê diaxivin, alfaba latîni bi alfaba biyani tînin zimên lê ya erebî wek “alfaba kurdî” nîşan dikin (Rêşîd, 2008).

Hinek ronakbîrên Soranî, wek Ferhad Şakelî, di wê baweriyê de ne ku alfaba latîni nikare fonetîka kurdî rast bide: “Çêdibe di alfbeya kurdî ya niha de yek an du netemamiyên fonetîkê tê de hebin lê di alfabe ya latîni-tirkî de kêmîr heft dane fontên netemam hene ku bi tu curek nivîseke kurdî bêyî wan fontan nayê nivîsîn. Ev rêk bi beravajîya vê banga nerast û nezanîstî ye ku hin xwedêgiravî xwedevanên kurdînezan ên bêganperest dikin ku qaşo tîpên latîni dengên zimanê kurdî baştir derdibirin.”<sup>10</sup>

Nivîskar di wir de alfaba latîni wek alfaba “latîni-tirkî” tîne zimên û dibêje: “Bikaranîna alfabeya latîni ji bo zimanê kurdî projeyêke dirindane ya emperyalîzmê ye bo dîrxistina neteweya kurd ji hemû raborî û dîroka xwe û ji bo jibîrbirina rêk û rîşeyên fikrî û ruhî ên wê û bo ragirtin û têkdana pêşkeftinên mezin ên di warê ziman û edebiyatê de li Kurdistanê nemaze yên ku di Kurdistanê Îraqê de hatine afirandin, ji bo jinavbirina prosesa netewebûnê ku di sed sala 20’an de serkeftinên baş bi dest ketine.” Li gor nerîna nivîskar ne ku Kurdiya Başûr, Kurdiya Bakur jî nikare bi alfabe ya latîni bê nivîsandin. Nivîskar li ser Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî disekine û dibêje ku mirhov bi alfaba latîni nikare berhemên wa bixwêne. Nivîskar, mirhovên ku alfaba latîni dixwazin, wek “rojavaperest” nîşan dike.

Di encamê de mirhov kare bêne zimên ku gengeşeyên di çarçova zimên û alfabe ye de bi gelemperî li ser wêje tînin kirin. Di ser wa gengeşa de xwiya dibe, ku raman ev e; heçko ziman qet nayê guherîn û her demî statîk e.

Zimanê Kurdî: Asoyêke nediyar. Ferhad Şakelî. [http://pukmedia.com/kurdi/index.php?option=com\\_content&task=blogcategory&id=19&Itemid=19](http://pukmedia.com/kurdi/index.php?option=com_content&task=blogcategory&id=19&Itemid=19)

Hêjayê gotinê ye ku pewîst e gengeşe bi gelek alî ve were guftûgokirin. Goran Candan (2008) di vê baweriyê de ye ku ti car alfabe nabe sedema duzimanî. Li gor nerîna nivîskar arîşe/pirsgrîka zimanê kurdî pîrsek rewşenbîrî ye. Ji bo çareserkirinê jî nivîskar rêgekekê balkeş dide ber her alîyan: “Bi kurtî pîrs, pîrsek rewşenbîrî ye. Formula wê ya hêsan jî ev e: Gava ku tu bi zaravayê xwe baş bizanibî, tu bi otomatîkî jî zaravayên din ên kurdî jî têdige hî. Lê gava ku tu zaravayê xwe BAŞ NAS NEKÎ - wek nimûne em bibêjin gava zaravayê te bi kurmançî be - tu hingê bi soranî yan bi dimilî qet jî nizanî, zaravayên din ên kurdî di guhê te de dikare wek frensî yan rûsî bêt bihistin! Lê gava ku me zaravayê xwe baş nas kir, em bêguman hingê jî zaravayên din ên kurdî jî pîr û pîr baş têdige hên. Hingê yên bi dimilî, soranî û kurmançî dipeyivin, wê bêyî astengek bi hev re bipeyivin û ji hev xweş têbigehên” (Candan, 2008a). Weke ev mînakên jor didin xwiyakirin, mijara alfabe û mijara zimanê serekî ji bo Herêma Kurdistan bi hev re hatine girêdan. Ev xêletî nahêle ku gengeşeyên baş li ser yekkirina alfaba Kurdî werin kirin. Gelek kem mirhov bi standardkirina zimên û alfabe ji hev cûda têdigihîjin. Bi rastî ev her du beş gerek ji hev cûda verin gengeşekirin û gawa yekemîn ev e ku pêşî alfabe were sererastkirin.

### Alfaba Latîni an Alfabeya Erebi

Armanca Celadet Bedirxan ev bû ku hemû zaravayên Kurdî bi alfaba latîni werin nivîsandin. Lê belê zelal e ku pirsgrîka alfaba kurdî heta îro jî nehatiye çareserkirin. Di vê rewşê de jî nikare were çareser kirin. Ango zimanê kurdî hê gelek lêkolîn dixwaze, pewîstî bi sazî û îradeyekê netewî heye. Mînak: hê ji bo gelek mirhova ne diyar e, gelo çend zaravê kurdî hene?, Kijan in? Çend devokê wa zarave hene?, Kijan zarave ye, kijan devok e? Divê çilo werin binavkirin? û gelekê din. Hê ne ferhengên zanyarî, ne ferhengên etîmolojî, ne ferhengên herêmî ne berhemên rastnivîstî (ortografi) hene. Zimanzan gelek kêma in. Ne sazî, ne enstîtû, nê jî zanîngehên zimanê kurdî hene. Di vê rewşê de hinek zû ye ku mirhov behsa zimanê standardkirine bike, lê standardkirina an jî yek-kirina alfabe çiqasî mijarêkê zanyarî ji be, wukasî mijarêkê ramyarî yanî siyasî ye jî.

Ango Kurd di nebeqîna herêmên çandî yên mezin wek persî û erebî de ne, hewceyî alfabekekê serbixwe nekirine. Sedem jî bo vê mijarê pîr in. Lê belê alfaba erebî û ya latîni her du jî alfabe yên bîyanî ne, sûd û windayî di her du ka de jî hene.

Li vir mirhov kare gelemperî ji bo bilêvkirina tîp, deng, peyv û bêje de hîpotezekî bavêjê holê: Zimanek di bandora kijan zimanê bîyanî de be, bilêvkirina wî zimanî digre ser xwe. Alfaba wî zimanê bîyanî jî bandora wî berdevam dike. Ew rewş tê wê watê:

- Hek îro alfaba erebî bibe alfaba kurdî, bandora erebî li ser kurdî kirî, we bimêne.
- Her xebata pak kirina zimane kurdî bi alfaba erebî, we bê encam bimêne.

Lê belê hek alfaba Kurdî bibe alfaba erebî, hingî newşê Kurdê nû we karibin berhe-

men wêjeya Kurdî ye klasîk ji zimanên wan ên resen bixwînin.

Alfaba ku Celadet Bedirxan danî sih û sê tîp bûn. Ango Bedirxan divêya hemû devokên zarava Kurmancî bêne zimên û alfabeyekî çêke ku her dengê va devok û zaravayên din jî bi lêv bike. Ango hinek ji van devokan bin bandora tirkî, hinek bin bandora erebî, hinek jî bin bandora farsî de bûn û peyvên resen ên kurdî bi pîranî ne zelal bûn. Bedirxan mecbur mabû hinek tîpên di bi ser ve bike.

Alfabeya Kurmanciya jêr ne alfabeya erebî ne alfabeya persî ye. Alfabe li gor Kurmanciya navîn hatiye danîn. Bi rastî, alfaba erebî kare baştir dengê kurdiya nenivîskirî bide û ev sûda tenê ya alfaba erebî ye. Wek jer de tê xwiya kirin, alfaba latînî ya ku Bedirxan jî bo kurdî diristkirî, nikare hemû dengê kurdî bide. Lê belê sûdê alfaba latînî jî ya erebî pirtir in.

### Kêmasiya tîpên erebî û latînî

Alfabeya erebî de tenê dengdar (Konsunant) hene. Ji bo tîpê “w”, “u”, “û”, “o” tene yek tîp heye. Ji bo tîpê “y”, “ê”, “ê”, “î” tene tîpek heye. Tîpa “î” tune ye.. Ev alfaba erebî ya ku Kurd bi kar tînin, ne sedî sed wek ya erebî ye. Ji qeyna tîpa “î”, dengdêrên din yê jî bo kurdî pêwîst in di alfaba erebî ya Kurmanciya jêr de hene. Kêmasiya tîpê latînî ev in ku tîpê latînî dengê hemû tîpên kurdî nadin. Mînak: di Kurdî de du dengên “ê”, “k”, “p”, “t”, “ç”<sup>11</sup> û heta qadekî tîpa “h” du deng hene. Bi alfaba latînî de cudadeti di nav wek “ker” de tune ye. Mînak;

1) “k” - ker (Eşek)

2) “k” - ker (sağır)

Wek mînaka tîpa “k”, tîpa “e” jî heman arîşe derdixe hole:

1) “e” - Evîn

2) “e” - Emer

Mirhow kare bêje, ku mînaka duyê (2) ji bandora erebî tê. Lê belê peyva “ewr”, peywekê Kurdî ye û di nav tîpê latînî dengê vê “e”yê tune ye. Di peyvên Kurdî wek “Evîn” karin gelek baş bi alfaba latînî bèn bilêvkin, lê peyv wek mînaka du (2) di alfaba latînî de arîşeya çêdikin.

Wek li jor hatî gotin, gelek tîpên din jî hene ku du “deng” a didin. Hinek ji wan arîşeyên bi alfaba latînî ne. Lê belê ev tîp bi gelemperî di peyvên bîyanî de, wek yê erebî, tê bikaranîn.

Mînak: Tîpa “H”

11- Di Rêzimana Kurdî de ç, k, p, t, r tîpe cewî/dudeng in (Bêkes 2004).

Hêlin, hek, hebûn, hevî û hwd. ev peyv Kurdî ne û ti arîşê di vir de nîne. Lê belê peyvên wek Hesên, Hecî û hwd. ji erebî tên û ji bo vê yekê arîşe têxe mijarê.

Mînak: Tîpa “ê” wek li jor hatî danîn.

Elif û erd

Ew û eşîr

Erzan û emr.<sup>12</sup>

Ev tîp cur bi cur denga didin, hinek jê yê biyanî ne û hinek jê bi Kurdî ne, lê belê ji bo wan denga ne tîpên bi serxwe hatiye danîn, ne ji rastnivîsek hatiye diristkirin.

Ev mînak didin xwiyakirin ku ew tîpê latînî yên ku Celadet Bedirxan ji bo dengên Kurdî pêjirandî bi sêdî sed nê ehil in. Lê di vir de pirsgirêk ne pirsgirêka Bedirxan e, pirsgirêk ew e ku heta niha ti kesî, ku ji berhemên Bedirxan biburê, derneketiye. Kurdî zimanekî indo-ewropeyî ye û nê samî ye. Xuya dike ku Kurmanciya jêr gelekî bin bandora erebî de maye û hinek karakterê kurdî wunda kiriye. Mînak, *ergativ* û *zayend* di vî zaraveyê de nemane. Alfaba latînî wê bandora erebî ser Soranî kêmîtir bike û rê ji zelalbuna wê re weke. Lê belê biryara alfaba Kurdî ji bo Kurmanciya jêr ne teknîkî, çandî, wêjeyî ye, bes bi ramiyarî yanî siyasî ye.

## Encam

Hêjaye gotine ye ku wek *Ferate Dengizî*, Seroke Enstîtuya Amedê, ani ziman, îro li gora salên bêre standardiyekê Kurdî, Kurmanciya jor, derketiye holê.<sup>13</sup> Bêrî encamdana standardkirina zimên an guherandina alfabe gerek e axivêrên her zaraveyî, berî her tiştî, zaravê xwe baş fêr bibin. Di warê zanyarî de lêkolîn werin kirin, devok û zaravayên Kurdî werin ber hev kirin. Saziyê zanyarî werin diristkirin. Arîşe ne di pêşketina zaravakî de ye, arîşe di nebûna saziyê netewî de ye. Herêma Başûr kare alîkariyek giring bide zaravayên din. Îro her du zaravê mezin (Kurmanciya jor û ya jêr) wekî pêwîst be, ji dêla ku ji zimanê biyanî bigrin, peyva ji hev bigrin. Wekî arêşeya alfabe were çareserkirin, hingî axivêrên her du zaravaya karin nivîsarên zaravayê din bixwînin.

Divê rewşenbîrên Kurdistanê Başûr di mijara zimanê standard de opsiyona Kurmanciya jor ji bînin zimên. Ew ne ji bo kuştina Kurmanciya jêr e, ji bo jiyana Kurmanciya jor e û hem berjewendiya herêma û yê Gelê Kurd di ve opsiyonê de hene. Wilo xwiya dike ku Sorana di Herêma Başûr de beşê çandî/zimanî/perwerdeyî, Behdînanan beşê leşkerî girtine.

Di gelek nuça de tê diyarkirin ku Kurmanciya jor di zaningehê Sorana da qedexe ye. Aknewsê ji demekî Kurmanciya jor di malpera xwe de rakiribû. Ew mînak

12- Ev mînak ji pirtuka Çeto Özel (2004) girtine.

13- [http://www.avestakurd.net/news\\_detail.php?id=9868](http://www.avestakurd.net/news_detail.php?id=9868)

Hesepûr mafdar derdixin. Heke Kurmanciya jor ji wek Kurmanciya jêr ev 90 sal in hatibana piştgirîkirin, arîşeyên ku Kurd îro pê re mijûl dibin wê kêmtir bana. Ji bo kurdî fersendek gelek baş derketiye. Ev jî hebûna Herêma Kurdistanê Başûr e. Li Başûrê Kurdistanê, di 15ê Êlûna 2009'an de 1.250.000 zarokê Kurd bi destê 85.000 mamosteya û di 5.000 dibistana de dest bi perwerdeyê kirin.<sup>14</sup>

Li gor ramana GfbV, heke îro zarokê Kurd li Kurdistanê Bakur dest bi perwerdeyê bikin, hijmara wa wê 3 milyon be û ji bo wa 10.000 dibistan pediv bê. Wekî ev kutle bi alfabekî perwede bibe, rêgekê mezin wê ji bo rewşenbîrî û ronahiya kurdî re vebe<sup>15</sup>. Ji bo wê alfabayek nû pêwîst e.

### Çavkanî

Bedir Khan, Emir Djeladet ve Lescot, Roger. 1986. Kurdische Grammatik. Kurmancî-Dialekt. Kurdisches Institut, Deutsche Sektion, Bonn. Verlag für Kultur und Wissenschaft, Bonn

Bekes, Dr. Kamiran. 2004. Bingehên rêzimana kurdî. Babol Druck

Behrendt, Günter. 1993. Nationalismus in Kurdistan. Schriften des deutschen Orient-Institut. Hamburg

14- Fahri Karakoyunlu: Ji zimanên ku dijîn re; El Fatîha...!

15- <http://europenews.dk/de/node/7087>



Bruinessen, Martin van. 1997. Kurden zwischen ethnischer, religiöser und regionaler Identität. (in): Ethnizität, Nationalismus, Religion und Politik in Kurdistan. *Kurdologie*; 1. (Hrsg.) Carsten Borck; Eva Savelsberg; Siamend Hajo. Münster: LIT, 1997 S. 185-216

Burkay, Kemal. 1997. Geçmişten Bugüne Kürtler ve Kurdistan. *Coğrafya – Tarih – Edebiyat*. Cilt 1. Deng Yay.

Candan, Goran. 2008. Pîrs û gelşên zîman pîrseke rewşenbîrî ye -1- <http://www.pdk-bakur.com/modules.php?name=News&file=article&sid=1132> .....(2008a) Pîrs û gelşên zîman pîrseke rewşenbîrî ye -2- 04.08.2008.<http://www.pdk-bakur.com/modules.php?name=News&file=print&sid=1135>

Dengîzî, Ferate. 2010. Hewldana xwebûnê: Enstîtuya Kurdî ya Amedê. 10 Tebax 2010. [http://www.avestakurd.net/news\\_detail.php?id=9868](http://www.avestakurd.net/news_detail.php?id=9868)

Franz, Erhard. 1968. Kurden und Kurdentum. *Zeitgeschichte eines Volkes und seiner Nationalbewegungen*. Deutsches Orient-Institut, Hamburg

Hesenpûr, Emîr. 2010. Şovînzîma soranî û efsaneyên wê (1). *Weşandin*: 2010-03-23. <http://www.kulturname.com/?p=3094>

Karakoyunlu, Fahri. 2009. Ji zîmanên ku dijîn re; El Fatîha...! <http://www.argun.org/2009/09/23/ji-zimanen-ku-dijin-re-el-fatiha%E2%80%A6/>

Kerîm, Mehemedê Mela. 2008. Em çi bikin da xwendin bi yek diyalekta kurdî be. 2008-09-09. <http://www.kulturname.com/?p=270>

Ong, Walter. 1995. *Sözlü ve Yazılı Kültür/Sözün Teknolojileşmesi* İstanbul.

Özel, Çeto. 2004. *Kurdiya Nûjen. Weşanên M*, İstanbul

Reşîd, Tosinê. 2008. Bo wê gengeşeye meyzêne: Nivîsa rojnamevan û nivîskarê ezîdî ye Ermenîstane 05.08.2008 <http://www.celadet.com/modules.php?name=News&file=article&sid=355>

Strohmeier, M.; Yalcin-Heckmann, Lale. 2003. *Die Kurden*. Verlag C.H. Beck, 2., durchgesehene Auflage, Nördlingen

Şakelî, Ferhad. [...] *Zîmanê Kurdî: Asoyeke nediyar*. [http://pukmedia.com/kurdi/index.php?option=com\\_content&task=blogcategory&id=19&Itemid=19](http://pukmedia.com/kurdi/index.php?option=com_content&task=blogcategory&id=19&Itemid=19)

